QULIXKIRINA MEYE P'ADŞATIYÊ

KANÛNA PÊŞIN (DÊSAMBIR) 2014

T'ÊMA VÊ MEHÊ: Ji xizna xweye qenc, ku wer'a hatiye dayînê "tiştêd qenc" derxin (Met. 12:35a, *ÎM*).

H'EFTIYA JI 8 KANÛNA PÊŞIN

K'ilama 41 û Duakirin

❑ **Hînbûna K'itêba Pîroz di Civatêda:**
bh Serê 14, abz. 17-21 (30 deqe)

❑ **Mek'teba Dannasînkirinê:**
Xwendina K'itêba Pîroz: Yêşûa 1-5 (10 deqe)
№ 1: Yêşûa 1:1-18 (4 deqe yan hê kêm)
№ 2: Xeyset-H'unurêd Xwedê (*td* 39C) (5 deqe)
№ 3: Serhatî 91 (*my*) (5 deqe)

❑ **Civata Qulixiyê:**
K'ilama 40
10 deqe: "Tiştêd Qenc", yêd ku seva vê Mehê Hatine Hazirkirinê. Gotar. Dîna xwe bide t'êmaya vê mehê. (Met. 12:35a). Me sitand xizna r'uh'anî ji ewêd ku me r'astiyê hîn kir. (Binihêr'e "Birca Qerewiliyê", 1 Nîsanê, sala 2002, r'ûp'. 16, abz 5-7.) Em jî gerekê "tiştêd qenc" ku cem me hene, t'evî meriya p'arevekin (Gl. 6:6). H'ewasa guhdara mezin ke hindava "tiştêd qenc" ko emê di vê mehêda li ser Civata Qulixiyê bistînin. Emê alîk'arî bistînin ku bikaribin feresetêd xweye hînbûnê hê mezin kin ku k'ilamêd t'eze jî hîn bin.
20 deqe: "Hîn be wekî di Qulixkirinêda Hê Cêr'ibandî bî; Nîşan ke wekî Çawa Derbaz Dibe Hînbûna K'itêba Pîroz bi P'irtûka, 'Çi Hîn Dike K'itêba Pîroz?'". Şêwirkirin. Bira qulixk'arê cêr'ibandî yan jî pêşeng, bi t'emaşê nîşan kin ku çawa derbaz dibe hînbûna K'itêba Pîroz bi p'irtûka, "Çi Hîn Dike K'itêba Pîroz?".
K'ilama 44 û Duakirin

Hîn be wekî di Qulixkirinêda Hê Cêr'ibandî bî; Nîşan ke wekî Çawa Derbaz Dibe Hînbûna K'itêba Pîroz bi P'irtûka, "Çi Hîn Dike K'itêba Pîroz?"

Ev Yek Çir'a Ferz e: Gelek meriv dikarin fe'm nekin, ku çi tê h'esabê çaxê em wanar'a dibêjin wekî t'evî wan hînkirina K'itêba Pîroz derbaz kin. Ewana dikarin dişirmîş bin, ku wê t'evî k'omekê bibine yek, yan jî gerekê xwe li tiştekî bigirin. Dewsa ku meriyar'a bêjin wekî em dixwazin t'evî wan hînkirinê *destpêkin*, em dikarin wanar'a *nîşan kin* ku çawa derbaz dibe hînkirina K'itêba Pîroz. Nava çend deqada, hela hê ber derî jî, tu dikarî *nîşan kî* wekî çiqas h'ewas û kêrhatî dikare bibe ev hînkirin.

Çawa Bikin:

- Paşî wê yekê çaxê tu nasiya xwe bidî xweyê malê, ji wî bipirse wekî dibeke ew derheqa axiriya dinyayê berxwe dik'eve.
- Bêjê, ku gelek meriv jî derheqa wê yekê berxwe dik'evin û dîna wî bide serecemê ji k'itêba "Çi Hîn Dike K'itêba Pîroz?". Şiroveke ku di vê k'itêbêda hene dersêd usa, yêd ku hêsa têne fe'mkirinê, û yêd ku nîşan dikin wekî çi hîn dike K'itêba Pîroz derheqa axiriyê. Usa jî bêje ku li wir derheqa cûr'e-cûr'e t'êmêd din jî tê şirovekirinê, û ji wî bipirse wekî k'îjan serî wî xweş tê.
- K'itêbê wîr'a bide û dîna wî bide li ser wî serî, ku ewî bijart. Şiroveke ku abzasada têne dayînê cabêd wan pirsa, yêd ku destpêka serîda nin.
- Bêje xweyê malê ku hergê ew dixwaze, bira abzasa pêşin bixûne. Paşê jî, pirsa abzasê bixûne û t'evayî caba pirsê bivînin. Dîna xwe bide û şêwir bike derheqa r'êzêd ji K'itêba Pîroz, yêd ku vê pirsêva girêdayî ne. Xweyê malêr'a nîşan ke, wekî çawa tu k'itêba xweda caba pirsa xez dikî.
- Bixûnin abzasa din, lê îjar bêje xweyê malê wekî ew bi giliyê xwe caba pirsê bide.
- P'ayê wî bide û xeber de derheqa serlêdana dubare, seva ku evê dersê xilaz kin.
- Hergê dibe, dîna xweyê malê bide li ser vîdêo "Ça Derbaz Dibe Hînbûna K'itêba Pîroz?", ya ku li ser jw.org heye.

Evê Yekê vê Mehêda Bide Xebatê:

- Yahowar'a dua bike, wekî qewata te k'erem ke û wekî tu bikaribî hînkirina K'itêba Pîroze t'eze destpêkî (Fîlî. 2:13).
- Bixebite ku nîşan kî, wekî çawa derbaz dibe hînkirina K'itêba Pîroz bi p'irtûka "Çi Hîn Dike K'itêba Pîroz?". Yan jî bixebite ku çaxê derdik'evî dannasînkirinê, lapî kêm carekê bikaribî meriyar'a nîşan kî vîdêo "Ça Derbaz Dibe Hînbûna K'itêba Pîroz?".

 © Wachtturm Bibel- und Traktat-Gesellschaft der Zeugen Jehovas, e. V., Selters/Taunus

H'EFTIYA JI 15 KANÛNA PÊŞIN

K'ilama 37 û Duakirin

❑ **Hînbûna K'itêba Pîroz di Civatêda:**
bh Serê 15, abz. 1-8 (30 deqe)

❑ **Mek'teba Dannasînkirinê:**
Xwendina K'itêba Pîroz: Yêşûa 6-8 (10 deqe)
№ 1: Yêşûa 8:18-29 (4 deqe yan hê kêm)
№ 2: H'emûşk Xwedakîr'a Qulix Nakin (*td* 39Ç) (5 deqe)
№ 3: Serhatî 92 (*my*) (5 deqe)

❑ **Civata Qulixiyê:**
K'ilama 10
15 deqe: "Derbaz Dikin Hînkirina K'itêba Pîroze Kêrhatî". Pirs û cab. Paşî şêwirkirina abzasa 3, t'emaşe ji du p'ara nîşan kin, k'îderê ku qulixk'ar û ewê ku K'itêba Pîroz hîn dibe, şêwir dikin abzasa 8 di serê 15-da ji k'itêba "Çi Hîn Dike K'itêba Pîroz?". Di t'emaşa pêşinda qulixk'ar gelek xeber dide. Di t'emaşa dudada qulixk'ar pirsêd seva dişirmîşbûnê dide, çi ku alî wî dike pêbih'ese derheqa nihêr'andina wî merivî, yê ku K'itêba Pîroz hîn dibe.
15 deqe: H'aceta ku Alî Te Dike Derbaz kî Hînkirina K'itêba Pîroz. Şêwirkirin. Dîna guhdara bide ser p'ara ji jw.org "Çi Hîn Dike K'itêba Pîroz?" (Bik'eve HÎNKIRINÊD K'ITÊBA PÎROZ > CAHIL.) Şêwir bike wekî çawa em dikarin evê e'lametiyê bidine xebatê, ya ku wê alî me bike t'evî h'emû meriya hînkirina K'itêba Pîroze kêrhatî derbaz kin. Ça em dikarin bidine xebatê ew pirsêd ku di vê p'arêda hene, seva ku bigihînine dilê meriya? Bira qulixk'ar monologê nîşan ke û bide xebatê ew p'arêd ji malperê, çi ku wê alî wî bike dişirmîş be derheqa h'ewcêd wî merivî, t'evî k'îjanî ku hînkirinê derbaz dike û pirsêd kêrhatî jî hazir dike. Xilaziyê guhdara hêlan ke, ku bibine dersdarêd baş û bidine xebatê ew tiştêd qenc ku cem me hene, seva ku bikaribin bigihînine dilê meriya û alî wan bikin (Met'lk. 20:5).
K'ilama 30 û Duakirin

Derbaz Dikin Hînkirina K'itêba Pîroze Kêrhatî

1 T'u kes nikare Xwedêr'a qulix ke, h'eta ku Yahowa ewî berbi xwe "nek'işîne" (Yûh'n. 6:44). Çi jî hebe qulixk'arê ku hînkirina K'itêba Pîroz derbaz dike, gerekê ji aliyê xweva h'emû tiştî bike, ku alî meriya bike nêzîkî Bavê xweyî e'zmana bin (Aqb. 4:8). Seva vê yekê lazim e hazirbûn. Seva ku alî meriya bikî fe'm bikin nêta mizgîniya xêrê û pêşda her'in, bes nîne t'enê abzasê bixûnî û pirsêd neşirkirî bidî.

2 Seva ku hînkirina kêrhatî derbaz kin, qulixk'ar gerekê alî meriya bike wekî ew (1) fe'm bikin ku çi hîn dike K'itêba Pîroz, (2) qebûl kin hînkirinêd K'itêba Pîroz, û (3) biqedînin ewê yekê, çi ku K'itêba Pîroz hîn dike (Yûh'n. 3:16; 17:3; Aqûb 2:26). Carna çend meh lazim e seva ku alî meriya bikin, van sê gava biqedînin. Her gaveke ku meriv dike, dide k'ifşê wekî ew heleqetiya xwe t'evî Yahowa mezin dike û xwe t'esmîlî wî dike.

3 **Derheqa Nihêr'andina Meriya Pêbih'ese:** Em gerekê pêbih'esin hela merivê ku hîn dibe, fe'm dike û qebûl dike hînkirinêd K'itêba Pîroz, yan na. Seva wê yekê lazim e wekî ne ku t'enê em xeber din, lê meriya hêlan kin nihêr'andina xwe bêjin (Aqûb 1:19). Gelo ew fe'm dike, wekî çi hîn dike K'itêba Pîroz derheqa wê t'êmayê, ya ku hûn şêwir dikin? Ew dikare bi giliyê xwe ewê t'êmayê şiroveke? Çi ew dişirmîş dibe derheqa wê yekê, çi ku hîn bûye? Gelo ew bawer dike wekî çi ku K'itêba Pîroz hîn dike, ev r'ast e? (1 T'êsln. 2:13). Ew fe'm dike ku gerekê hine guhastina di e'mirê xweda bike, seva ku li gora wê yekê bijî, çi ku ew ji K'itêba Pîroz pêh'esiya? (Kols. 3:10). Seva ku cabêd wan pirsa bistînin, em gerekê pirsêd seva dişirmîşbûnê

1. Çi cabdarî heye cem qulixk'arê ku hînkirina K'itêba Pîroz derbaz dike?
2. Çi lazim e seva ku hînkirina K'itêba Pîroze kêrhatî derbaz kin?
3. Çir'a dersdarêd cêr'ibandî pirsêd seva dişirmîşbûnê didine meriya?

© 2014 Christian Congregation of Jehovah's Witnesses.
Druck und Verlag: Wachtturm, Selters/Ts. Printed in Germany

bidine meriya, û paşê *guh bidine* wan (Met. 16:13-16).

4 Cem her merivekî heye xeyset û fikirêd wane şexsî, çi ku nav wanda k'ûr r'ûniştine. Lema jî carna we'de lazim e, seva ku ewana van tişta nav xweda biguhêzin (2 Korn. 10:5). Lê hergê meriv qebûl nake yan jî naqedîne ew tiştêd ku hîn bûye? Sebirkirin û we'de lazim e, seva ku Xebera Xwedê û r'uh'ê pîroz, h'ukum kin li ser dilê wan meriya, yêd ku K'itêba Pîroz hîn dibin (1 Korn. 3:6, 7; Îbrn. 4:12). Çaxê em divînin wekî meriyar'a çetin e hînkirina K'itêba Pîroz fe'm bikin yan jî biqedînin, em gerekê wana nedine zorê. Lê wê baş be wekî em derbazî t'êma din bin. Hergê em bi sebirkirin û h'izkirinê berdewan dikin K'itêba Pîroz meriya hîn kin, hingê ew dikarin hê hêlan bin, wekî guhastinêd lazim nav xweda bikin.

4. Em çi gerekê bikin çaxê divînin, ku meriyar'a çetin e hînkirina ji K'itêba Pîroz fe'm bikin yan biqedîne?

H'EFTIYA JI 22 KANÛNA PÊŞIN

K'ilama 25 û Duakirin

❑ **Hînbûna K'itêba Pîroz di Civatêda:**
bh Serê 15, abz. 9-16 (30 deqe)

❑ **Mek'teba Dannasînkirinê:**
Xwendina K'itêba Pîroz: Yêşûa 9-11 (10 deqe)
№ 1: Yêşûa 9:16-27 (4 deqe yan hê kêm)
№ 2: Gelo Rêlîgiya Şe'dêd Yahowa T'eze ye? (*td* 32A) (5 deqe)
№ 3: Serhatî 93 (*my*) (5 deqe)

❑ **Civata Qulixiyê:**
K'ilama 20
***5* deqe: H'ewcêd civatê.**
25 deqe: "Mek'teba Dannasînkirinê ya 2015, Alî Me Dike ku Hînkirina Xwe Baş kin". Şêwirkirina berpirsiyarê Mek'teba Dannasînkirinê. Berpirsiyarê mek'tebê dikare bijbêre hine abzasa, seva ku pêşiya şêwirkirinê ew bêne xwendinê. Dîna xwe bide li ser guhastina Dersa № 1, li ser we'dê seva fikirêd bijartî ji K'itêba Pîroz, û usa jî ser şîretê ku berpirsiyarê mek'tebê dide. Bira abzasa 7 bê xwendinê, û paşî şêwirkirina vê abzasê t'emaşê nîşan ke, k'îderê ku r'ûspî derbaz dike hînbûna K'itêba Pîroze malbetê, t'evî jin û zar'a xwe û dide xebatê t'êmayê ji bûklêta "Çi Em Dikarin Hîn bin Ji Xebera Xwedê?", r'ûp'êla 14. H'emûşka hêlan ke, wekî ewana bi t'emamî di vê hînkirinêda k'ar bikin, ya ku mek'teba dannasînkirinê dide û r'ind bidine xebatê k'itêba "Hîn Dibin di Mek'teba Dannasînkirinêda".
K'ilama 2 û Duakirin

Mek'teba Dannasînkirinê ya 2015, Alî Me Dike ku Hînkirina Xwe Baş kin

1 Dawidê zebûrbêj nivîsî: "Gotina ku dertê ji devê min, fikira ku diçe ji dilê min, bila maqûl be dîtin li pêş te, ya Xudan [Yahowa, *DT*] tu yî zinar û rizgark'arê [xilazk'arê] min" (Zeb. 19: 14, *ÎM*). Em jî dixwazin wekî gotinêd me Yahowar'a xweş bên, çimkî em qîmet dikin ew qedirê ku mer'a hatiye dayînê. Dêmek ku em dikarin di civatêda û qulixkirinêda, r'astiyê bêjin. Mek'teba Dannasînkirinê ev yek ji wan mecala ye, bi saya k'îjanî ku Yahowa seva qulixkirinê me hîn dike û hazir dike. Ev hînkirin, her h'eftî nav t'emamiya dinyayêda weke 111 000 civatada zêdetir, derbaz dibe. Ev hînkirin, alîk'arî da xûşk-birêd ji t'emamiya dinyayê û ji cûr'e-cûr'e mileta, wekî ewana bibine dannasînk'arêd cêr'ibandî, û bikaribin bi bawerbûnê, taktîk û mêrxasî meriya hîn kin (K'ar. Şand. 19:8; Kols. 4:6).

2 Di bernama mek'tebêda ya sala 2015, wê bêne hildanê t'êmêd ji bûklêta "Çi Em Dikarin Hîn bin ji Xebera Xwedê?" (*igw*), "T'êmêd K'itêba Pîroz seva Xeberdanê" (*td*), û "Serhatiyêd K'itêba Pîroz" (*my*). Xêncî wê

yekê hine guhastin hatine kirinê di wî we'deyîda, yê ku seva fikirêd bijartî ji K'itêba Pîroz dihate dayînê, û usa jî guhastin di dersa № 1-da hene. Derheqa wan guhastina, û r'êberiyê ku çawa p'arêd ji mek'tebê gerekê bêne derbazkirinê, jêrê tê şirovekirinê.

3 **Fikirêd Jibartî ji K'itêba Pîroz:** Ew birêd ku vê dersê distînin, gerekê nava *du deqada* şêwir bikin derheqa *r'êzekî* kêrhatî ji K'itêba Pîroz, ya ku li vê h'eftiyê gerekê bixûnin. Hazirbûna baş wê alîk'ariyê bide, seva ku we'dê k'ifşkirîda, bikaribin fikirêd qîmet derbazî civatê bikin. Xêncî wê yekê, civatêr'a *6 deqe* tê dayînê, seva ku ewana nava 30 seniyada yan hê kêm, caba xwe bidin û bêjin ku çi tiştêd h'ewas wana seva xwe dît we'dê xwendina K'itêba Pîroze li vê h'eftiyê. Seva ku em bikaribin cabêd kêrhatî nava 30 seniyada bidin, lazim e xwe pêşda hazir kin û dişirmîş bin. Û ev yek hînkirineke baş e seva me. Ev usa jî mecalê dide yêd dinêna, wekî caba xwe bidin û bêjin ew fikirêd h'ewas, ku wana we'dê lêkolînkirina xwe dît.

4 **Dersa № 1:** Ew we'dê ku seva xwendina K'itêba Pîroz dihate dayînê, kêm bû ser *sê deqe yan hê kêm* û r'êzêd seva xwandinê jî kêm bûn. Ewêd ku evê dersa xwendinê bistînin, gerekê çend cera bi dengê bilind xwer'a bixûnin û r'ind dîna xwe bidine ser gotina xebera, ku bikaribin hêsa bixûnin û fikira bi fe'mdarî derbaz kin. Her qulixk'arekî Yahowa, gerekê ji aliyê xweda h'emû tiştî bike ku bikaribe r'ind xwendinê bizanibe, çimkî xwendin jî ev rolake ferz e di qulixkirina meda. Em çiqasî şa ne, ku geleka ji zar'êd me, xwendinê r'ind zanin. Lema jî dê-bav hêjayî p'ayîdayînê ne, çimkî ewana bi h'izkirin qewatê didane xebatê, seva ku alî zar'êd xwe bikin bibine xwendek'arêd baş.

5 **Dersa № 2:** Ev dersa xûşka ne, ya ku nava *pênc deqada* gerekê bê derbazkirinê. Xûşk gerekê ewê t'êmê hazir kin, k'îjan ku wanar'a k'ifşkirî ye. Çaxê ev ders li ser h'îmê wê bûklêtê ye, "Çi Em Dikarin Hîn bin ji Xebera Xwedê?", xûşk gerekê evê t'êmayê t'evî cûr'ek ji dannasînkirinê t'evgirêde, seva ku ew bi rêalîstîk û kêrhatî be seva mihala wan. Lê çaxê ders li ser h'îmê "Serhatiyêd K'itêba Pîroz e" (*my*), hingê xûşk gerekê r'êzêd layîq seva t'êma xwe bijbêre û nîşan ke ku çi em dikarin ji mesela K'itêba Pîroz hîn bin. Seva t'êma xwe dikarin r'êzêd zêde jî bidine xebatê, yêd ku vê t'êmayêva wê girêdayî bin. Berpirsiyarê mek'tebê, xûşkeke din ça alîk'arçî wê k'ifş ke.

6 **Dersa № 3:** Ev dersa *pênc deqe*, wê bê dayînê yan xûşkar'a yan jî birar'a. Çaxê ev ders xûşk distînin, hingê ew gerekê usa bê hazirkirinê, çawa ku Dersa № 2-da tê gotinê. Hergê ev ders bira distîne, û ev li ser h'îmê "T'êmêd K'itêba Pîroz seva Xeberdanê" ye (*td*), yan jî "Serhatiyêd K'itêba Pîroz" (*my*), ew gerekê t'êma xwe ça gotarê hazir ke. Ewêd ku evê dersê distînin, gerekê t'êma xwe zelal kin, r'êzêd layîq ji K'itêba Pîroz bijbêrin û bidine xebatê, usa jî nîşan kin wekî çi em dikarin ji serhatiyêd K'itêba Pîroz hîn bin.

7 **Guhastina T'eze di Dersa № 3-da, seva Bira:** Çaxê ev ders wê li ser h'îmê vê bûklêtê be, "Çi Em Dikarin Hîn bin ji Xebera Xwedê?" (*igw)*, hingê ev gerekê bi t'emaşê nîşan kin, dereca usada: qulixkirina t'evî malbetê yan jî

dannasînkirin. Berpirsiyarê mek'tebê seva vê dersê wê kifş ke alîk'arçiya, û dereca ku gerekê bidine xebatê. Alîk'arçiyêd wî birayî k'îjan ku ev ders hazir dike, gerekê neferêd mala wî bin, yan jî birakî ji civatê. R'êzêd zêde ji K'itêba Pîroz ku vê t'êmayêva girêdayî ne, dikarin bêne xebitandinê. Car-cara ev ders dikare r'ûspiyar'a jî bê k'ifşkirinê. Wî çaxî ev r'ûspî xwexa dikare bijbêre alîk'arçiya û derece. Bi r'astiyê jî ev hêlankirineke mezin be seva civatê, ku bivînin wekî çawa r'ûspî hîn dikin neferêd malê, yan birêd din.

Qebûl ke û bide xebatê şîreta, ku bikaribî pêşda her'î

8 **Şîret:** Berpirsiyarê mek'tebê wê *du deqa* bide xebatê, seva ku paşî her derk'etina xûşk-bira p'ayê wan bide û usa jî şîretêd fikirandî li ser h'îmê k'itêba "Mek'teba Dannasînkirinê". Çaxê berpirsiyarê mek'tebê e'lam dike derheqa derk'etina xûşk-bira, ew pêşda gerekê nebêje ku li ser k'îjan dersê ewana dixebitin. Lê paşî derk'etina wan, berpisiyarê mek'tebê gerekê bi h'elalî p'ayê wan bide, *e'lam ke wekî li ser k'îjan dersê ew xebitîne*. Usa jî gerekê dîna xwe bidê, ku çima cem wana r'ind derk'et ev ders, yan jî bi nermî şiroveke wekî çir'a ferz û kêrhatî ye, ku şagirt dîna xwe bidine vê dersê.

9 Navnîşana dersa, di vê k'itêbêda dikarin bivînin "Mek'teba Dannasînkirinê" li ser r'ûp'êla 79-81 (ru). Çaxê xûşk yan bira dersa xwe xilaz kin, hingê paşê civatê yan jî we'dekî din, berpirsiyarê mek'tebê, di k'itêba wanda gerekê bi qelemê k'ifşkirina bike û başqe bipirse, wekî şagirt hazir kir ew dersa ku k'otasiya wî serîda ne, çi ku wîr'a hatibû k'ifşkirinê. Usa jî ew dikare başqe p'ayî û şîretêd kêrhatî bide wî. Çaxê xûşk yan bira şîretekê distînin ya ku mek'tebêva û dersa wîva girêdayî ye, hingê ev yek gerekê h'esab ke ça mecala ku wê alî wî bike r'uh'anîda pêşda her'e (1 Tîmt'. 4:15).

10 Hergê xûşk yan bira we'dê derk'etina xwe dirêj dikin, hingê berpirsiyarê mek'tebê yan jî alîk'arçî, gerekê bi zengilê, yan jî bi tiştekî din, wana bi nermî bidine sekinandinê. Ew xûşk yan bira ku dersê çêdikin, we'dê zengilê gerekê fe'm bikin ku ev tê h'esabê wekî ewana gerekê cimlêd xwe xilaz kin, û ji sênê peya bin. Binihêr'e k'itêba "Mek'teba Dannasînkirinê", r'ûp'. 282, abz. 4 (ru).

11 Seva ku di Mek'teba Dannasînkirinêda bi dersa derk'evin, lazim e hine de'wakirina biqedînin. Û em h'emûşka hêlan dikin ku di vê yekêda k'ar bikin. (Binihêr'e k'itêba "Mek'teba Dannasînkirinê", r'ûp'. 282, abz. 6 (ru).) Ev hînkirina ku di vê mek'tebêda distînin, alîk'ariyê dide cime'ta Yahowa, seva ku mizgîniya xêrê derheqa P'adşatiyê, meriyar'a dannasîn kin û bi bawerbûnê, taktîk, û h'izkirinê hîn kin. Bi r'astiyê jî Yahowa hêjayî ye, wekî her kesê ku k'arê distînin ji mek'teba dannasînkirinê, wî hurmet-r'ûmet kin! (Zeb. 148:12, 13; Îşa. 50:4).

H'EFTIYA JI 29 KANÛNA PÊŞIN

K'ilama 16 û Duakirin

❑ **Hînbûna K'itêba Pîroz di Civatêda:**
bh Serê 15, abz. 17-20 û r'ûp'. 219-220 (30 deqe)

❑ **Mek'teba Dannasînkirinê:**
Xwendina K'itêba Pîroz: Yêşûa 12-15 (10 deqe)
Wek'ilandina Mek'teba Dannasînkirinê (20 deqe)

❑ **Civata Qulixiyê:**
K'ilama 11
20 deqe: Bi Xîret "Tiştêd Qenc" Hîn Dikin Zar'êd Bawermend, û Ewêd ku K'itêba Pîroz Hîn Dibin (Met. 12:35a). Şêwirkirin. Bide xebatê ev r'êzêd ku jêrê nivîsar in, seva ku nîşan kî wekî çi em gerekê hîviyê bin ji zar'êd bawermend û ji wan meriya, yêd ku K'itêba Pîroz hîn dibin: 1 Korint'î 13:11; 1 Petrûs 2:2, 3. Şiroveke ku çi tê h'esabê xebera "te'm" kin, û "şîrê sipiyî", û ça em dikarin di vê yekêda alî wan meriya bikin, k'î ku K'itêba Pîroz hîn dibe û usa jî alî zar'êd bawermand bikin. Şiroveke prînsîpa ku di Marqos 4:28-da nivîsar e. (Binihêr'e "Birca Qerewiliyê", ya 15 Kanûna Pêşin, sala 2014, r'ûp'. 12, abz. 6-8, (ru).) Hilde qisekirinê ji qulixk'arê cêr'ibandî yan jî, ji dê yan bavekî, yê ku dikare şiroveke wekî çawa ewî alî zar'ê kir yan jî merivekî, seva ku ev r'uh'anîda pêşda here (Efes. 4:13-15; binihêr'e "Qulixkirina Meye P'adşatiyê", Qot'iya pirsa, ya meha Gulanê sala 2014).
10 deqe: "Bi Mêvanh'izî, 'Tiştêd Qenc' P'areveke (Met. 12:35a)". Şêwirkirin. Çi k'ar yan jî çi qewimandin hebûn cem hineka, yêd ku mêvanh'izî dane k'ifşê? Bêje guhdara bira caba xwe bidin û bêjin, ku çawa em dikarin mêvanh'iziya xwe nîşan kin hindava meriya, xût hindava wan, yêd ku qulixkirina hert'imda nin. Bêje wekî civat dikare xebervanêd t'eglîfkirî gazî ke ser xwarinê.
K'ilama 50 û Duakirin

Bi Mêvanh'izî, "Tiştêd Qenc" P'areveke (Met. 12:35a)

Bê şik, wekî her kes ji me dixwaze bi "mêvanh'iziyê", "tiştêd qenc" p'areveke t'evî meriya (R'om. 12:13). R'ûspiyar'a r'êberî hatiye dayînê, seva ku ewana p'erê r'iya xebervanêd t'eglîfkirî hildin li ser xwe û wana t'eglîf kin ser xwarinê. Xêncî wê yekê dibeke em xwe ji mêvanh'iziyê dûr digirin, çimkî em destteng in, yan jî berxwedik'evin ji bo wê yekê, ku mêvan bêne li mala me. Em gerekê hildin h'esab ew şîreta Îsa ku ewî dabû Mert'ayê. Çimkî şîreta Îsa dikare alî me bike, wekî em berxwenek'evin (Lûqa 10:39-42). Îsa dîna xwe dabû ku "p'ara qenc" ya mêvanh'iziyê, ev heye hevaltî û hêlankirin, ne ku sifira biha û mala bedew çêkirî. Hergê em evê şîretê bidine xebatê, emê bikaribin anegorî Xebera Xwedê, "tiştêd qenc" p'arevekin t'evî xûşk-bira (3 Yûh'n. 5-8).

Wek'ilandina Mek'teba Dannasînkirinê

Pirsêd ku jêrê nivîsar in, wê bêne nihêr'andinê di Mek'teba Dannasînkirinêda, destpêbûyî ji h'eftiya 29 Kanûna Pêşin sala 2014.

1. Nihêr'andina me çi cûr'eyî ye hindava fermana ku di Qanûna Ducarî 14:1-da nivîsar e, derheqa xweh'er'işandinê we'dê şîna miriya? [3 Teşrînê , *w04* 15/9 r'ûp'. 27 abz. 5]
2. Çir'a p'adşêd Îsraêlê gerekê ji k'itêba Qanûna Xwedê, dîsa xwer'a k'itêbekê ji ber vê binivîsiyana, û t'emamiya r'ojêd e'mirê xwe bixwandana? (Qan. Dcr. 17:18-20) [3 Teşrînê, *w02* 15/6 r'ûp'. 12 abz. 4]
3. Çir'a dihate gotinê wekî nehêlin ku "ga û k'er bi hevr'a cotk'arîyê" bikin, û çawa Mesîhî diqedînin ev ferman derheqa wê yekê, ku "t'evî nebawer'a" nek'evine "binê nîrekî"? (Qan. Dcr. 22:10, *PK'M*) [10 Teşrînê, *w03* 15/10 r'ûp'. 32]
4. Çir'a hatibû gotinê wekî "t'u kes ne destar'", "ne jî kevirê wêyî binî k'efîl gerekê hilneda? (Qan. Dcr. 24:6, *PK'M*) [17 Teşrînê, *w04* 15/9 r'ûp'. 26 abz. 3]
5. Bi çi dilî Îsraêlî gerekê guhdariya xwe bidana k'ifşê, û çi me gerekê qulixkirinêda hêlan ke? (Qan. Dcr. 28:47) [24 Teşrînê, *w10* 15/9 r'ûp'. 8 abz. 4]
6. Di Qanûna Ducarî 30:19, 20-da, k'îjan sê de'wakirinêd sereke em seva jîyînê divînin? [24 Teşrînê, *w10* 15/2 r'ûp'. 28 abz. 17]
7. Gelo ji me tê de'wakirinê, wekî bi r'astiyê jî em gerekê nîvdengî bixûnin h'emû giliyêd ku em ji Destpêbûnê h'eta E'yantî dixûnin? Şirovekin. (Yêşû 1:8) [8 Kanûna Pêşin, *w13* 15/4 r'ûp'. 7 abz. 4]
8. K'î ye R'êberê eskerê Yahowa, derheqa k'îjanî ku di Yêşû 5:14, 15-da tê gotinê, û ça ev serhatî dikare me hêlan ke? [8 Kanûna Pêşin, *w04* 1/12 r'ûp'. 9 abz. 2]
9. Çi Ak'an de'w da berbi gune, û mesela wîyî xirab çi me hîn dike? (Yêşû 7:20, 21) [15 Kanûna Pêşin, *w10* 15/4 r'ûp'. 20-21 abz. 2, 5]
10. R'oja îroyîn mesela K'aleb çida me hêlan dike? (Yêşû 14:10-13) [29 Kanûna Pêşin, *w04* 1/12 r'ûp'. 12 abz. 2]

K'ilamêd T'eze seva Qulixkirinê!

1 Li ser "Civaka Birca Qerewiliyê" ya hersalî, ya ku 4 Cotmehê di sala 2014-da derbaz bû, hatibû e'lamkirinê derheqa t'ezekirina k'itêba k'ilama ku niha cem me heye. Bi r'astiyê jî ev e'lametîke p'ir' baş bû! Wê derê dîsa carekê kirine bîra h'emû guhdara, wekî k'ilamêd meye P'adşatiyê, qulixkirina meda, cîkî ferz digirin (Zeb. 96:2).

2 Dibeke tu dişirmîş dibî, 'Gelo çir'a lazim hat k'itêba k'ilama t'eze kin?' Çend me'nî hene. Ya pêşin, fe'mkirina me hindava Nivîsarêd Pîroz çiqas diçe hê zelal dibe, û ev yek dikare li ser lîrîka k'ilamêd me jî h'ukum ke (Met'lk. 4:18). Dîsa me'nîk heye: Gelek gilî-gotin û xeber, yêd ku niha k'itêba k'ilamada têne xebitandinê, ji "Welger'andina Dinya T'eze" ya berê, hatibûn hildanê. Lema jî ev lîrîka gerekê bêne t'ezekirinê, wekî li gora vê yekê be çi ku "Welger'andina Dinya T'eze" ya t'ezekirîda heye. Bi r'astiyê jî ev xebateke p'ir' mezin e, wekî h'emû lîrîka li gora van guhastina çêkî. Xêncî wê yekê hatibû safîkirinê, wekî hine k'ilamêd t'eze jî di k'itêba k'ilamada zêde kin.

3 Gelo em gerekê hîviyê bin, h'eta ku ev k'itêba k'ilamêd t'eze bê neşirkirinê ku paşê bikaribin bidine xebatê? Na. Em şa ne e'lamî we bikin, wekî çend meha şûnda, hine k'ilamêd t'eze wê li ser Malpera jw.org bêne danînê. Çaxê k'ilamêd t'eze bêne danînê, hingê xilaziya bernama Civata Qulixiyêda, ev yek wê bi nîşana "k'ilama t'eze", bê k'ifşkirinê.

4 **Çawa K'ilamêd T'eze Hîn bin:** Dibeke ne hêsa be k'ilama t'eze hîn bin. Mîna zebûrbêj, em dixwazin li ser civata bistirên û xwe ker nekin (Zeb. 30:12). Seva ku k'ilama t'eze hîn bî, dîna xwe bide van tiştêd jêrê nivîsar.

- Çend cara guhê xwe bide nivîsandina pîano ya k'ilamê, ya ku wê li ser Malpera me bê danînê. Çiqas hê zêde tuyê guhê xwe bidî miqamê, haqas hê wê ter'a hêsa be, ewê bîra xweda xwey kî.
- Lîrîkayê hîn be û bîra xweda xwey ke.
- Miqamê t'evî lîrîkayê bistirê. Ewê alî te bike ku îda k'ilamê bizanibî.
- We'dê Qilixkirina t'evî Malbetê, çend deqe weqetînin seva ku k'ilamêd t'eze bistirên û hîn bin.

5 Çaxê nava çend mehada, li xilaziya bernama Civata Qulixiyêda, k'ilama t'eze wê hebe, hingê civat wê carekê guhê xwe bide nivîsandina pîano ya vê k'ilamê. Paşê guhdar wê bi nivîsandina miqama pîano, t'evayî evê k'ilamê bistirên, çawa ku em seva k'ilamêd din jî dikin.

6 Çaxê em derheqa vê yekê dişirmîş dibin, em divînin wekî çaxê em li ser civata distirên, ev mecalê dide me, seva ku dengêd xweye şabûnê bikine yek, ku bi vê yekê pesina bidine Yahowa. Xêncî wê yekê em gerekê xwer'a bikine xeyset, ku çaxê li ser civata k'ilam destpêdibe, bê me'nî ciyê xwe nehêlin û dernayên.

7 Dîsa tiştek heye, ku çawa em dikarin r'azîbûna xwe seva van k'ilamêd pîroz bidine k'ifşê. Mesele, pêşiya ku bernama civata mezin destpêbe, t'imê miqam tê vêxistinê. Salê du cara, ji çar qolbêd dinyayê, xûşk û bira seva şixulê k'ifşkirî, bi k'îsî xwe diçine li Patêrsonê, Nîû Yorkê, seva ku hazir kin miqameke bedew, ku em qulixkirina xweda bidine xebatê. Lema jî çaxê berpirsiyarê bernamê, e'lam dike ku ciyê xwe bigirin û guh bidine wê yekê ku çi orkêstor seva me hazir kiriye, em gerekê hema usa jî bikin. Hergê emê usa bikin, ewê alî me bike wekî dilê xwe hazir kin seva wê înformasiyonê, ku wê bê gotinê (Ezr. 7:10).

8 Îro, civata xwe emê xilaz kin bi stirana k'ilama meye t'eze, ya ku bi navê usa ne "Bira P'adşatiya Te Bê!" Ev k'ilama, derheqa k'îjanî ku li ser civata hersalî hatibû gotinê, bi r'astiyê jî ça nîşaneke mexsûs e seva sedsaliya bûyîna P'adşatiyê.

9 K'ilamêd t'eze bi r'astiyê jî "tiştêd qenc in", ku Yahowa dide me (Met. 12:35a). Werên bira nêta me ev be, wekî evan k'ilamêd t'eze hîn bin û bi dil bistirên, ku bi vê yekê pesin û hurmetê bidine Xwedayê xwe! (Zeb. 147:1).

H'EFTIYA JI 5 ÇILEYÊ

K'ilama 54 û Duakirin

❑ **Hînbûna K'itêba Pîroz di Civatêda:**
bh Serê 16, abz. 1-9 û r'ûp'. 221-222 (30 deqe)

❑ **Mek'teba Dannasînkirinê:**
Xwendina K'itêba Pîroz: Yêşûa 16-20 (8 deqe)
№ 1: Yêşûa 17:11-18 (3 deqe yan hê kêm)
№ 2: K'î ye Xwedê?(*igw* r'ûp'. 2 abz. 1-3) (5 deqe)
№ 3: Îsa Kur'ê Xwedê ye û P'adşayê K'ifşkirî (*td* 13A) (5 deqe)

❑ **Civata Qulixiyê:**
K'ilama 28
30 deqe: "K'ilamêd T'eze seva Qulixkirinê!" Şêwirkirin. Çaxê abzasa 6 şêwir dikin, seva civatê vêxe nivîsandina pîano ya k'ilama "Bira P'adşatiya Te Bê!". Paşê bêje guhdara wekî r'abin û bistirên k'ilama t'eze. Dibeke lazim be du cara bistirên, seva ku civat bikaribe k'ilama t'eze hîn be.
K'ilama t'eze "Bira P'adşatiya Te Bê!" û Duakirin

E'lametî

■ E'debyetêd bona belakirinê seva meha **Kanûna Pêşin:** "Çi Hîn Dike K'itêba Pîroz?", yan jî yek ji van belavoka: "Çi Hûn Derheqa K'itêba Pîroz Dişirmîş Dibin?", "H'alê Dinyayê wê Çawa be?", "Çi Lazim e, seva ku Malbet Bextewar be?", "K'î bi R'astiyê li ser Dinyayê H'ukum Dike?", "Gelo wê bê ew We'de, Çaxê Kul-Derd Îda T'une bin?" yan jî "Gelo bi R'astiyê Mirî Dikarin Dîsa Bijîn?". **Çile û Sibat:** Bidine xebatê yek ji van broşûra, yêd ku bi 32 r'ûp'êla nin: "Mizgîniya Xwedê seva Meriya", "Guh Bide Xwedê" yan jî "Guh Bide Xwedê û Bijî H'eta-H'etayê". **Adar:** "Serhatiyêd K'itêba Pîroz".

■ Êvara Bîranînê ya sala **2016**, wê di r'oja Çarşemê, 23 Adarê be.

■ Destpêbûyî ji 1 Çileyê, sala 2015, di civatêda guhastin hatine kirinê, derheqa wê yekê ku Şe'miya pêşine her mehê, emê îda nedine xebatê seva destpêkirina hînkirina K'itêba Pîroz. Lê dewsê, niha qulixk'ar dikarin h'emû r'ojêd Şe'miya jûrnala bela kin. Û hînkirinêd K'itêba Pîroz jî, nava mehêda k'engê dest dide dikarin destpêkin û bidine xebatê jûrnala, yan jî e'debyetêd din seva hînbûnê.

■ Paşî xilazkirina hînbûna k'itêba "Çi Hîn Dike K'itêba Pîroz?", wê broşûra "Mizgîniya Xwedê seva Meriya" di civatêda derbaz bin. Ewê destpêbe 6 Nîsanê, sala 2015 h'eta 6 Tîrmehê sala 2015. Paşê, 13 Tîrmehê sala 2015 h'eta 12 Cotmehê sala 2015, emê derbaz bin broşûra "K'itêba Pîroz Çi E'lamî Me Dike?". Civat gerekê evan broşûra sifareş bikin, seva ku di civatêda êp'êce hebin.

Cûr'ek ji Pêşanînê

"Mizgîniya Xwedê seva Meriya".

"Îro em têne cem meriya û xeber didin derheqa fikireke h'ewas ji K'itêba Pîroz. Gelek merivêd t'evî k'îjana ku me xeber dida, e'cêbmayî dimînin ji bo wê yekê ku çir'a Xwedeyê h'izkirin dihêle wekî haqas kulderd dinyayêda hene. Ça hûn dişirmîş dibin, serî-sêrîda qirara Xwedê seva e'rdê ew bû ku merî biçerçirin?" [Hîviyê be, bira caba xwe bide.] Paşê veke dersa 5, bixûne û şêwir bike 2 abzasêd pêşin û usa jî r'êzêd K'itêba Pîroz, ya ku bi h'erfêd xar k'ifşkirî ne. Broşûrê xweyê malêr'a bihêle û xeber de deheqa serlêdana dubare, seva ku şêwir bikin pirsa din ya ku bi h'erfêd r'eş k'ifşkirî ye.

Pêşdaçûyîn di Qulixkirinêda

Di Gurcistanêda cara pêşin derbaz bû civata mezine sêr'ojî li ser zimanê Kurmancî. Ev bernama civata mezine sêr'ojî, hatibû çêkirinê ça bernama ya dur'ojî. Ev pêşdaçûyîneke mezin bû. Li ser vê civata mezin 266 merî hatibûn, û h'eyşt jî hatine nixumandinê. Ev civat di meha T'ebaxêda derbaz bû. Û li ser vê civatê hatibûn mêvan ji Almaniyayê, Ermenîstanê, Rûsyayê û T'irkiyeyê. Ev civata mezin, şabûneke p'ir' mezin anî xûşk-birar'a.

Cara pêşin jûrnala "Birca Qerewiliyê" li ser zimanê K'urdî-Kurmancî, wê derk'eve ya meha Çileyê sala 2015.

km14 12-RDU Ga 1409111